

Dibistan Nîşna Xêr-Bêrê Ye

Enehîte morad

Va ye em , li ber deryê salike nû ji vekirina dibistanan e .Wisan jî, xwediyên şagrtan , di nava xem û qisawetan de , gêjo –mêjo dibin . Nemaze di ev bihabûna her tiştî ku piştta mirov dişkînede , ev ji hêlekê ve û li hêla dî ve jî , ew zarokên sala yekê diçine dibistanê, pir cefa û dijwariyê di warê fêkirina zimanê biyanî [Erebî] de dibînin . Bê ku karibin têbigêhin an jî,fêmbikin ku , çima û ji bo çi ew li malê bi zimanê dê [kurdî] daxife û li dibistanê bi zimanê biyanî [Erebî] diaxife û fêrî xwendinê dibe. Vêca jî zarokên me, di nava nakokî û heyamekî ne tundirstî de xwe nasdikin, her wisan jî , birek ji zarokan bi girî , şîn û kotek diçine dibistanê ne mamoste û ne jî ,xwediyên zarokan dikarin êş û hestê zarok yê nazik û bi çûk nasbikin û bi dilovavî bipejirînin . Belikîm karibin jana wî sivik bikin , çiqas girînge ku xwediyên zarok pêre biçine dibistanê û dostaniyê bi mamostên zarok re çêbikin ta ku , bi hvdure alîkar bin hingê hêmenî di dilê zarok de çî digire, evîna çûna dibistanê li rex wî geş dibe .Ne gengaze ku , em berê zarok bi kotek ,pû û lêdanê bidine dibistanê . Zor girînge ku , dibistan di baweriya zarok de nîşana xêrê be , ne jî li pêş wî tirs û bive be ! Ci qas mixabin, birek ji xwediyên

zarokan hene, tenê zarokên xwe dişînin dibistanê tû hew . Tu carî lê napirsin ku , ew zarok mîna sêwî û bêxwedî li pêş heval û mamostên wî nîşan dibe! Bi vê awî hino-hino, zarok ji dibistanê hirçipêlî û vediceniqe. Piştire bê guman ew dibistanê berdide ji jiyana çandî û xwendinê bi dûr dikeve . Xwediyên ev tun şagirtan , bê erê û na berê wî zarokî didne hin pîşe û karine ne li yaq û gora temenê wî yê biçûke .

Ev yekek ji pirsgirêkên gelê me yê kurd li vê sûriyê ne . Çiqa pir mixabin liugel ku, serdema me ya , sedsala bîst û yekan e ,hê jî dibistanek bi zimanê me kurdan, li vê welatî nine ! Ma gelo ev nîşana çî ye?. Ne ya rûreşî û setemê ya tersî şaristanî û pêvajoka demê ye !. Vêca jî zor girînge ku , em li zarokên xwe xwedî derkevin ,êş û jana wan nsbikin, her tiştî li gora hiş û ramna wan şirofe bikin û ne jî wan di tariyê de bihêlin . Ji ber ku zarok senbola berdewamî û duhatiya miletan e , û hebûna dibistanan jî, nîşna xêrê ye , weke helibestvanê nemir Cîger-xwîn gotiye : Xwendin nebe kes naçe pêş... peyda dibin pir derd û êş .

Li dawî , bi navê me û komîta Newrozê û bi boneya sala nû ya xwendinê, . em serkeftinê û rojên xweş û geş ji hemû zarok û xwendekarên kurd re hêvî dikin .